

## Dumahîk : Kurd di ...

Sûriyê çî ji dewletê dixwazin , em dixwazin guhdarî te bikin !)) .

Apê Osman li wan vedigerand û digot : (( Hûn dewlet in , di civata neteweyên yekbûyî de hûn endam in , îmza dewletê jî li ser belge nameya mafên mirovan tomarkirî ye ...em dixwazin dewlet li gor îmza xwe be , ne zêde !)) .

Mezinê wan berpirsiyarên dewletê careke dî ji Osam Sebrî dipirsî : (( Mamoste Osman , em dixwazin ji te bibihîsin û ji te fêm bikin , hûn Kurd li Sûriyê çî dixwazin? )) . Careka dî Apê Osman li wan vedigerand û digot : (( Em tuştêkî zêde ji we naxwazin , tenê weke min gotî , hûn weke dewlet karibin li îmza xwe bibine xwedî , belge nameya mafên mirovan a ku dewleta Sûriyê îmza xwe avêtiye binê wê , bête bikaranîn û ciyê rêzgirtina hemiyan be , ..Sûriyê bi xêr be , emê bi xêr bin birano .)) . Berpirsiyar dîsa dipirsî : (( Wekî dî hûn çî dixwazin )) .

O.Sebrî : (( Wekî dî mala we ava )) . Çaya xwe vexwarin û çûn , û ji hîngê ve , rûyê xwe li Osman Sebrî nemandin .

Mebest ji bîranîna vê bûyerê ewe ku , em karibin baş têbigihên , gelo ma cîgeh , rol û kartêkirina belge nameya mafên mirovan di siyaseta dewletan de her diçe qels û kêmtir dibe , an xurtir û bêtir dibe?. Mirov di wê hevî û baweriyê de ye ku her diçe xurtir dibe . Osman Sebrî ji hîngê ve ,

di wê baweriyê de bû ku , divê hemî li ser pirsê mafên mirovan rawestin û di ber de bixebitin û li wê belge nameya navnetewî xwedî derkevin.

Dr. Nûredîn Zaza jî , eger ne bêtir , lê belê ne kêmtirî Osman Sebrî li belge nameya mafên mirovan dibû xwedî , û bi herhawî bi dil û can , çî li civat û têkiliyên xwe yê civakî û normal û çî li hember dadgeh û berpirsiyarên dewletê di ber de dixebitî.

Di vê lêhatinê de hêjayî gotinê ye ku , ew liberxwedana nivîskî ya ku rehmetî Dr. Nûredîn li sala 1960-61 an bi bawerî û serbilindî pêşkêşî dadgeha karbedestîya dewleta Sûriyê kiribû , dimîne jêder û mînakeke dîrokî , hişmend û balkêş , her û her bi kêrî lêveger û xwendinê têt .

Herdu mezinên tevgera siyasî ya kurd li Sûriyê , Osman Sebrî û Nûredîn Zaza bi dil û can li mafên mirovane yê gelê Kurd dibûne xwedî û ewqas jî li dijî nijadperestiyê bûn , bi azadî û biratiya gelan re bûn , ne şerxwaz an jî judaxwaz bûn , ew aşîxwaz û wekhevîxwaz bûn .

Ji xal û naverokên peyman û belge nameyên mafên mirovan ên navnetewî hêjatir , xweştir û binirxtir nînin , ji ber ku hebûn , jîyan û rûmeta min û te dinasin , û di siha nîrxên mirovahî yê weha de , doza Aştî , Azadî û Wekheviyê ciyê xwe digre , geş dibe û riya xwe diqelêşe . Li ser vê riya dirêj û dijwar , xebata gelê Kurd her dê bidome û li dar be .

**Sînorê Yekta**